

"Êrîşa ser Hewlêrê hewleke tirsonek e û nikare îradeya xelk û serkirdayetiya Kurdistanê têt bide"

Kurdistan



Komîteya Navendî ya Partiya Demokratîk a Kurdistan- Sûriya PDK-S di daxuyaniyekê de êrîşa ser Hewlêrê şermezar kir û ragehand ev kiryara tirsonek li dijî yasayên navdewletî ye û bînpêkirineke mezin e ji serweriya dewleta Îraqê û Herêma kurdistanê re. PDK-

S tekez dike Hewlêr xwe li ber êrîş û gefên tirsonek naçemîne û dê berevaniyê li xwe bike dijî van kiryarên terorîstî. Emîndariya Giştî ya Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKSê di daxuyaniyekê de ragihand, "13ê Adara 2022, bajarê Hewlêrê Paytexta Herêma Kurdistanê careke din rastî êrîşa mûşekî hat û

taxên sivîlan, di nav de televîzyona Kurdistan24 û herwiha Konsulxaneyê Amerîka ya li wê derê hatin armanckirin." ENKS di daxuyaniya xwe de diyar dike: "Ev armancgirtina tirsonek ji Herêma Kurdistanê re bi behaneyên derewîn, ne tenê ewlehî û aramiya Kurdistanê dike armanc, lê belê Îraqê bi giştî jî dike

armanc, ji bo têtêbirina hewlên derxistina Îraqê ji tevliheviyê û têtêbirina rola çalak û erênî ya serkirdayetiya Herêma di serxistina piroseya siyasî ya wê de ye." ENKS tekez dike: "Êrîşên bi vî rengî û zextên li ser Kurdistanê, nikarin vîna gel û serkirdayetiya Kurdistanê têtê bibin û wan ji rola wan a çalak a ji bo serxistina

proseya siyasî nadin alî." ENKS ragihand, "ENKS di dema ku bi tundî vê êrîşa hovane şermezar dike, daxwazê ji civaka navdewletî dike ku li kêleka Herêma Kurdistanê û gelê wê raweste û ewlehî û aramiya Herêma Kurdistanê li hember wan metirsiyan biparêze."

Serhildana 12ê Adarê xaleke zêrîn e di dîroka doza Kurd li Kurdistana Sûriyê

Kurdistan

12 Adara sala 2004an gelê Kurd li seranserî Kurdistana Sûriyê ji Qamişlo û Cizîrê, Kobanê, Efrîn, Heleb û heta Şamê paytexta Sûriyê li dijî rejîma Esed serî hildan. Heya niha jî Kurdên Kurdistana Sûriyê wê rojê wek rojeke dîrokî û "Roja Şehîd" bibîr tînin. Di 12 Adara sala 2004an li yarîgeha Cîhad li bajarê Qamişlo, di dema lîstika futbolê ya di navbera her du tîmên (Cîhad û

Fitiwê) de , cemawerên tîma Dêrazorê sivikatî bi al û simbolên Kurdistana li nava yarîgehê kirin û bi dar û keviran ku berê xwe ji vê bûyerê re hatibû plankirin êrîşî cemawerên tîma Qamişlo kirin. Hêzên ewlekariya rejîma Esed li şûna ku navbênkariyê bike, bi guleyan û bi fermana parêzgarê Heskê yê wê demê Selîm Kebûl bi guleyan êrîşî cemawerên Kurd kir û di encam de hejmarek welatîyên bajêr şehîd kirin û hejmareke

din jî birîndar bûn. Herwiha cemawerên Tîma Dêrazorê jî bi hilîkopteran ji nava yarîgehê ji aliyê wan hêzan hatin derxistin. Xelkê Qamişlo bi coş û hêzeke bêhempa derketin kolanan û meş û nerazîbûn nîşandan, lê hêzên rejîma Sûriyê careke din êrîşî xelkê kir û hejmareke din ya welatîyan şehîd bûn û rewşeke tirsê di nava bajar de belav bû. Meş û xwepêşandan li dijî rejîma Sûriyê di wê demê de li Qamişlo

ranewestiya û berê xwe da tevahiya bajar û bajarokên Kurdistana Sûriyê û bi durşmên bijî Kurdistan, şehîd namirin hatin xemilandin. Herwiha bo cara yekem di dîroka rejîma Beis de jî peykerê Serokê berê yê Sûriyê Hafîz El-Esed li bajarê Amûdê ji aliyê xwepêşanderan ve hat şikandin û ji Dêrikê heya bi Kobanî û Efrîne navend û bargehên hikûmeta Bes hatin şewtandin û jinavbirin û desthilata Beis jî li gelek bajarên

Kurdistana Sûriyê hatibû destxistin. Di serhildana 12ê Adarê de zêdetirî 40 Kurdên Kurdistana Sûriyê li çend bajarên cuda cuda şehîd bûn û bi sedan kes jî birîndar bûn. Herwiha hêzên rejîma Sûriyê zêdetirî 3 hezar kes bi tometên cuda cuda zindanî kirin û hin ji wan bi salan di nava zindanan man, lê serhildan li wê salê ranewestiya û di sala 2011an de Kurdên wî perçeyê Kurdistana tevî Şoreşa Sûriyê bûn û careke din durîşm û simbolên Partiya Beis anîne xwarê. Ilham Omer wiha derbarê serhildanê dibêje, Serhildana sala 2004an di dîroka gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê gelekî giring bû, ji berk u navê Kurdan li tevahiya dunayayê derket, û ev yek dersek ji rejîma Esed re bû, ku heta niha jî danpêdan bi mafê rewşa yên gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê nekiriye, lewma pêwîste ev serhildan bi hemû hûrgiliyên xwe bibine belgeh û ji bo dadgehên navdewletî werin pêşkêşkirin heta ku rejîma Esed û destikên wê werin sizadan, nabe ev bîranîn were piştguhaxistin û ev yek jî ji partyên Kurdî di pileya yekem û nedyakaran tê xwestin. Siyamend Silo jî wiha nerîna xwe di vê derbarê de anî zimanê, rejîma Esed bawer nedikir ewqas serhildan nav û dengê xwe bistîne, lewma dixwestin bi hemû awayî serhildanê rawestîne, ji ber ku dizanîbû hêza gel gelekî xurt bibû, ez dikarim bêjim di wê demê de hemû aliyên Kurdî yek dest bûn, û bi hev re li dijî rejîma Esed rawestiyan. Ya herî giring di vê dema niha de em hemû Kurdên Kurdistana Sûriyê li ser rêbaza wê serhildanê bimeşin û şehîdên xwe jî bibîr bînin.



Nesredîn Birhik Pakrewanê gotina rastiyê



Hêvî Delî- Qamişlo

Hejmarek kesayetên Kurd xwedî rol û bandor di tevgera siyasî û civakî ya Kurdî de navên xwe bi tîpên zêrîn di dîroka Kurdayetiyê de nexişandin, yek ji wan xebatkar û pakrewanê gotina rastiyê "Nesredîn Birhik" Bavê Ela, kesayeteke welatparêz e ku herdem di bîr û baweriyaya gelê xwe de ye. Derbarê salvegera şehîdbûna xebatkar Nesredîn Birhik, Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-Sê Nafi' Ebdela ji Rojnameya Kurdistan re axivî û wiha got: Siyasetmedar û têkoşerê Kurd Bavê Ela bi netewbûn û niştîmanperweriya xwe di nav Kurdan de di hat naskirin û kesayetiya xwe ji bo kar û xizmeta azadiya millet û mafê gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê terxan kiribû, û roleke wî ya berbiçav di nava tevgera siyasî ya Kurd li Kurdistana Sûriyê hebû, û berdeham karên wî di berjewendiya gelê Kurd e bûye. Nafi' Ebdela wiha derbarê xebat û jiyana

Birhik berdeham dike û dibêje, Bavê Ela ji destpêka ciwanîya xwe ve tevli nava refên Partî bû, û ji bewriya wî ya bihêz di raman û hezkirina netewî û piştevaniya wî ji ciwanan re, wî kar di gelek rêxistinên xwendekaran de dikir, û karekî bêhempa encam dida, û ji ber kar û bîr û baweriyaya wî bi rêbaza Barzaniyê Nemir di sala 1998 an de, Birhik wek Endamê Mekteba Siyasî ya PDK-S hate hilbijartin, û Birhik bi dilpakî û dilsozî li ser rêya Barzaniyê Nemir, niştîmanperwerî û xizmeta milletê xwe di nava rêzên tevgera rizgarîxwaza Kurdistana de berdeham kir, û ji ber vê yekê jî Şehîd Nesredîn Birhik bû armanca rejîma Esed û gelek caran ji aliyê rejîmê ve gef lê dihatin kirin, û di sala 2004an piştî beşdarbûna wî di serhildana 12ê Adarê de, û daxwazên wî ji bo doza azadiya gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê ew hate girtin. Viyana hezkirina Birhik ya niştîmanperwerî ji rêbaz û kar û xizmeta Kurdayetî de di sala 2009an, careke din ji aliyê rejîmê ve hat zindankirin, lê ev astengi

nebûn kelem li pêşiya berdehamiya xebata Birhik ya netewî, û wî xebata xwe berdeham kir heta ku şehîd bû. Ji aliyê xwe ve, Endama Komîteya Herêmî ya Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya Lava Delî wiha derbarê Şehîd Nesredîn Birhik got: Nesredîn Birhik Pakrewanê gotina rastiyê, xwedan karîzmayeke siyasî û civakî bû, û cihê xwe di nav civaka Kurdî de girtibû û kesayetiyeke dilpak û dilsozê dibistana Kurdayetî û netewî bû ji bo nehiştina êş û azarên milletê xwe, di dawiyê de rêzdarî ji xwîna pakrewanan re yên jiyana xwe ji bo parastina doza Kurd terxan kirin .

Şehîd Nesredîn Birhik Di roja Duşemê 13-2012-02an de, şehîd Nesredîn Birhik ji aliyê grûpekî çekdar ser bi PYD ve hate gulebarankirin, ji bo nexweşxaneya Nûr ya Qamişlo hate veguhestin. Lê ji ber giranbûna birînên wî ji bo nexweşxaneya Martînî ya Helebê hate veguhestin, tevî ku jê re çend neştergerî hatin kirin, lê ji ber birînên wî yên giran



di 222012-2-an jiyana xwe ji dest da û şehîd bû. Şehîd Nesredîn Birhik li gundê Kevrê Dena yê ser bi Çilaxa ve. Sala 1960î de ji dayik bûye, xwendina xwe ya seretayî û navendî

li Çil Axa xwend, û ya amedayî li bajarê Heskê berdeham kir, û li Dêrezorê bawernameya peymangeha Pêşesazî beşê Elektirîkê bi dest xwe ve xist.

33 sal bi ser koça dawî ya Bilbilê strana Kurdî Mihemed Şêxo re derbas dibin

Kurdistan

Hunermendê Kurd navdar Mihemed Şêxo di sala 1947an de li gundê Xecûkê li Kurdistana Sûriyê hatiye dinyayê û di 9ê adara 1989an koça dawî kir. Navê Mihemed Şêxo yê rastî Mihemed Salih Şêxmûs e. Şêxo mezinê 11

bera ye. Di sala 1959an de dest bi xwendinê dîke, lê 3 sal şûnda dest ji mektebê ber dide.

Di salên xwe yên dibistanê de Mihemed Şêxo gelek hunermendên Kurd nas dîke. Ji bandora wan nêzikî muzîkê dibe û di sala 1969an de dest bi dengbêjîyê dîke.

Mihemed Şêxo ku bi Bavê

Felek tê naskirin, salên xwe yên di navbera 1969 û 1972yan li Libnanê ji bo xizmeta hunerê xerc dîke û li Beyrûtê 2 salan dersên muzîkê distîne.

Di sala 1972yan de bi hinek hevalên xwe re komek mûzîkê bi navê "Koma Serkeftin" ava dîke.

Mihemed Şêxo sala 1973yan derbasî Başûrê Kurdistanê dibe û li wir mîna hozan û şervanan kar dîke, têkiliyê xwe bi hunermendê Kurd ên din re saz dîke.

Ew paşê vedigere Sûriyê û li Şamê bi cih dibe. Li wir kasete xwe ya bi navê Ay Gewrê derdixê, lê li wir dewleta Sûriyê Mihemed Şêxo rihet nehişt û gelek caran tê binçavkirin.

Ew ji ber wê yekê carek din berê xwe da Başûrê Kurdistanê û di nav refên pêşmergeyan de cihê xwe digire. Bi têkçûna şoreşa Îlonê li Başûrê Kurdistanê re ew derbasî Rojhilatê Kurdistanê dibe û li wir kasetekê tomar dîke.

Li Rojhilatê Kurdistanê ji bilî karê xwe yê muzîkê çend salan mamostatiyê

jî dîke. Demek şûnda rejîma Îranê jî Şêxo wek dijberê rejîmê dihesibîne û derheqê wî de biryara binçavkirinê digire. Ji ber wê yekê Mihemed Şêxo piştî 11 salan carek din berê xwe dide Sûriyê û li wir bi hezkirineke mezin tê pêşwazîkirin.

Dewleta Sûriyê jî têkiliya Mihemed Şêxo û gelê Kurd aciz dibe û wî digire, davêjê zindanê. Lê ev biryar jî dengê Şêxo nade birîn.

Ew stranên xwe yê herî baş li heps û zindanan dibêje û di kilam û stranên xwe de derd û kulên gelê xwe û daxwaz û baweriyên wan bi hunermendiyek bilind tîne ziman.

Hunermendê mezin Mihemed Şêxo di sala 1983yan de vedigere Qamişlo û heta sala 1988an de gelek berhemên diafirîne.

Di 9 meha avdara sala 1989an de koça dawî kir û hersal xelkên deverê di vê rojê de li ser gora wî kom dibin û wî bibîra tînin û wesiyeta wî bi cî tînin, dema ku dibêje:

Gava ez mirim gelî zindiyan

Mî neveşêrin wekî hemiyan

Hemû adara win minê şiyarkin da bikime şînê ji bo me hemiyan.

Ev çend berhemên wî ne: Bavê Felek, Ay Gewrê, Cana min/Sînem, Koçê Me Barkir, Gulîzar, Ey Felek/Kewê, Êmê, Dil Perîşanim, Nesrîn, Ay Lê Gulê, Nalînêk û Gava Ez Mirim.

Welatiyê bi navê Sîpan Ehmed derbarê hunera Mihemed Şêxo wiha dibêje, Mihemed Şêxo tenê hunermendê Kurdistana Sûriyê nebû, belkî yê perçeyên din yên Kurdistanê bû, nav û dengê wî hebû, stranê wî gotine heta niha ti hunermendekî wek wî xweş nekiriye, ez dikarim bêjim ku ew bilbilê strana Kurdî bû. Şiyar jî wiha dibêje, hin hunermend hene dengê wan tenê ji bo nifşekî maye, lê Mihemed Şêxo ne wisa ye û heta niha, mebesta min nifşê niha jî lê guhdarî dikin û ji dengê wî hez dikin.

